

KURD EWRÛPE

Pirtûxaneyya Kurdî-Rêza Lêkalînê : 1

Beyhani Şahin

**LÊKOLÎNEKÎ QICIK
LI SER ZIMÊN**



FIRAT YAYINLARI

Bêyhanî Şahîn

**LÊKOLÎNEKÎ QICIK
LI SER ZIMÊN**



Fırat Yayınları

FIRAT YAYINLARI : 28

Temmuz 1995

Genel Dağıtım

Fırat Yayın - Dağıtım

**Divanyolu Cad. Binbirdirek İşhanı No:15
Sultanahmet-İstanbul
Tel:(0 212) 516 05 91 Fax: 518 84 15**

Baskı: Ceylan Matbaası

PÊŞGOTÎNEK

Wek ji edet em jî di destpêkirina hejimara me ya yekemîn da dixwazin ji xwendevanan ra *rojbaş* bibêjin. Di vê pêşgotina me ya kurt da dîyarîye ku em ê mekanibim bersîva gotina **Kurd-Ewrûpe** bidin, û hette em ê di nav hejmarekî da jî mekanibim. Mîna ku ji navê weşana me jî bellîye bersîva vê pirsê hewcedarîya lêkolînên hêja, kur û fireh e.

Di destpêkirina dema sedsala 18'an û vir da zimanên roava li ser zimanên rojhilat lêkolîn û xebatên xwe yên hêja her wiha heta îroj domandine û wek dîtbare wê di rojên dahatu da jî dîsan wisa jî bidome. Di dema destpêkirina van lêkolînan da tiştê ku zimanzan rastê hatine ew jî di navbenda wan zimanan da têkilîyên gelek nêzikî hev in, bûn e. Di vî warî da zimanê Medî (*Awestî, Zendî*) û Sanskritî rolên pir mezin girtin e. Mesela gava pirtûka bi saya zimanê Medî hatiye bershivandin. Ji paş wan lêkolînan tê dîtin ku di nav gelek zimanan da mîna ku ji eynî bingehê, kokê têne, belgeyên pir girîng hatine derxistin. Gava bi derxistina wan belgeyan zimanzanan jibo ku hin zimanan di nav komekî da bicivînin û navekî lê bikin, jê ra Îndo-Germanîsch (Hînd-Germenî) gotine û ji navê derketine. Paşê hin kesan navê Hînd-Cermen mîna Hînd-Ewrûpe bi nav kirin e. Li gorî me van navandinana tu wateniyekî nikanin bidin. Çima nikanin? Çiku jibo destpêkirina van zimanan heta zimanî Sanskritî paşda çûyî nêbese û çewtiyekî ye. Dîsa wek bi navê Cermen navandin jî nerastîye û navandinekî bi dilxwazîye.

Berî du -sê salan min daxwaz dikir ku kovarekî wiha bidim weşandinê û hin pirsgirêkên zimanê Kurdî bi rêk û pêk bi metodêkî zanistî bikolînim û bibersivînim. Lê ji ber hin sedeman min nekanîya bidim weşandin. Dawîya dawîn min got bila çî dibe bibe ez ê bi weşandina vê kovarê bikim û min wiha jî kir. Ez ê taybetî li ser dîrok û etîmolojîya zimanê Kurdî û li ser zimanên kewn yên rojhilat bisekinim. Di vî warî da lêkolînen ku li ser zimanê Kurdî hatine kirin mixabin ku gelek kêr in û

yên ku hatine kirin jî di naveroka xwe da înkâr kirina zimanê Kurdî zêdetir tu maneyan nadin. Wek tê zanîn tiştê ku dewletên dagirker anîne ser serê zimanê Kurdî bi rastî nehatiye ser serê qelandî. Her dewletekî dagirker li gor xwe hin teorîyên xwe yên sosret afirandiye û ajotiye meydanê û mixabin ku bi wan teorîyan (?!) jî mêjîyê gelek kesan jî şuştin e.

Nivîsa min ya bi navê "lêkolînekî qicik li ser zimên" gava ez jibo "konferansa zaravayên zimanê Kurdî ya navneteweyî" hatibûn vexwandin min amade kiribî (06-08/01/1995 Berlin). Li vir min hin bi nivîsên din ji ya berê firehtir kir.

Wek her weşanî em jî, jfbo ku kovara me biweşînin rastî pir dijwarîyên mezin hatine û hê jî em ê bêne. Di warê aborî da astengiyên me ji hemû dijwarîyan zêdetir e. Niha tiştê ku ez ji xwendevanan daxwaz dikim bila xwedîyê kovara xwe derkevin, bila bidin xwendin û bi çî awayhi dibe bila bibe, bila alîkarîyên xwe ji me kêr nekin. Yanî jibo ku em hejimara me ya duwemîn derînin, her tişt ji xwendevanên me yên ezîz û welathezan ra maye. Heta hejimara din bimînin di xweşîyê da

Beyhani Şahin

LÊKOLÎNEKÎ KICIK LI SER ZIMÊN

Lêbelê, her çiqas ev konferensa, „konferensa zaravayên zimanê kurdî ya navnetweyî“ hatibe bi nav kirin jî, ez dixwazim li ser etîmolojî ya zimanê kurdî bisekinim. Ji ber ku, gava bingeha zimanekî bi vekirî neyê zanîn û ji hêla din va jî rêzimana vî zimanî bête nivîsandin, dîyarîye ku wê çewtîyên gelek mezin bêtin çêkirin. Em bi mixabin jî dibêjin ku, zimanê kurdî ji ber van sedeman heta îroj gelek hesarên mezin jîya ye. Divê niha berî gelek çalakîyan, dîroka zimanê kurdî bi xebatên hêja bête kolandin û jibo „kurdî ya nûh“ çavkanîyên herî bingehîn, herî girîng bi vî awayî bîn amade kirin.

A niha em naxwazin li ser destpêkirina dema zimanan, çawa bûye û kîjan zimanî ji kîjan zimanî bandora xwe hilgirtîye, bi dûr û dirêj bipeyîvin. Lê dîsan jî berî ku derbazî hin gotinên din nebûme, dixwazim li ser zimanên ku bi navê „hînt-ewrûpî“ tên navandin çend gotinan bêjim.

Derketina zimanê „hînt-ewrûpî“ li coxrafya kurdistanê destpêkiriye. Ev gotin di van salên dawîn da ji

alî hin kesên dîroknas û zimannasan va jî hatiye gotin. Wekî tête zanîn hîma zimanê „hînt-ewrûpî“ bi zimanê Hîntî va tê gêradayîn. Destpêkirina vî zimanî jî du hezar sal (2000) berî zayînê ye; an jî wisa tête gotin. Li gorî me evan gotinana di nav xwe da tu rastîyekî nikarin îfade bikin. Çima nikanin? Em li ser vê pirsê gelek sekinîne û me li ser zimanên kevn xebatên xwe bi salan dûr û dirêj, kur û fireh ta roja me ya îroyîn domandîye. Em ê li jêr jibo gotinên ku em îdîa dikin çend nimuneyan bidin. Nimuneyên ku em dixwazin bidin wê ji çend cinavk û daçekan bê holê. Ji alî din va xênjî evan nimuneyan mirov dikare bi sedan mînakên din jî bide.

Dîsa Prof. Egon von Eiskstedt di pirtûka xwe ya bi navê „İlk Çağlardan Günümüze Türkler-Kürtler_İranlılar“da wiha dibêje: „Bi pêvajoya hezar salan kesê Mezopotamya’yî tekoşîna xwe kiriye. Li van çîyan, van begên ku serên xwe xar nedikirin yan derbazî hêlê Asurîyan yan jî derbazî alî Akadan dibûn. Îste tam jî, ji li vir xelkê Hînt-Germen belavî Mezopotamya’yê dibe. Ev xelkên Hînt-Germen di mabeyna 2000 salî ya **berî zayînê** da ji van çîyayan gî Mezopotamya û Babil dagir/îstila kirin. Ev dagiriya biyanî 400 sal domand.(B.Z 1600-1171) Vana di mabeyna Dîjle û Firatê da dewletek ava kirin, dewletê ku bi herî omrê dirêj bû“, dibêje (rûpel 47, Firat Yay. Eylöl 1993).

Gelî guhtar û rewşenbîrên hêja, wekî herkes jî dizane zimanê herî kevn û yê nivîskî bi xwe zimanê Sumerî ye. Vane çend salin ku em li ser zimanê Sumerî û Kurdî dixebitin û hevberkî kirina van herdu zimanan di xebatê xwe yê bi navê „Ceribandinek Li Ser Zimanê Sumerî-Kurdî/Etîmolojî“ da, bi hezaran bêje kom kiriye û etîmolojî ya bêjeyan jî bi nimereyan daye. Lê belê van peyvên ku di zimanê Sumerî û Kurdî da wek hev in bi dehan di nav zimanên din da jî xwe nîşanî me didin. Ger ewqas bêje di nav van zimanan da ewqas pir bin û bi belgeyan jî bîn îspat kirin, ma em ê dijberî van çi bibêjin? Yanî niha em dikarin bi hêsanî bêjin, zimanê ku bi navê *Hînt-Ewropî* tê naskirin bi eslê xwe, ango bi kokê xwe va bi zimanê Sumerî va girêdayî ye. Binêrin William H. McNeill di pirtûka xwe ya bi navê *Diroka Dinyayê* da çi dibêje: *Dibe ku hemu cureyên nivîsên ku têne zanîn, an direk an jî îndîrek ji zimanê Sumerî peydah bûyî bibin. Ew xelkên kevn ên ku nivîs nivîsandin peydah kiribûn, incax jibo kê dêhna xwe yê xwedê daye û kê nedaye dixwastin binivîsinin, sîrrê keşîşên sumerîyan, hunerên ewan ên ku bi qebiliyetên newaze anîbûn meydanê, xelkên din ji seyyaran paş hînbûna derfetên nivîs nivîsînê, dibe ku serkeftinî bibin* (r. 26, V Yayinlari, 1989 Istanbul).

Belê, keşîşên Sumerî di vî warî da rolên zor giring leyistine û ji Mezopotamya'yê bigirin heta Çîn'ê, Îndonezya'yê, Efrîka'yê, Rusya'yê, Yinanîstan'ê, Îtalya'yê,

Îspanya'yê, Îrlanda'yê, Îngilîstan'ê û ta Skandînavya'yê nivîs nivisandin belav kirine. Heger rewşa evan zimanan li gorî ku em dibêjin hatiye pê, wê çaxê zimanên ku bi navê „Hînt-Ewropî“ hatine bi nav kirin, divê bi eslê xwe va wek „Zimanê Sumer-Ewropî“ bê nav kirin. Lê hema wekî tê zanîn , îroj li tu derekî zimanê Sumerî nayê peyivîn. Incax wek her zimanî, zimanê Sumerî jî li dinyayê li cîyekî pêk hatiye. Ma ew derê ku zimanê Sumerî peyda bûye ne coğrafya kurdistan'ê ye? Ma li dinyayê tu belgeyek heye ku, hîma ziman û gelê Sumerî bi coğrafyek din va girê bide? Jibo bersîva van pirsan ne hewceye ku em bijên, na!

Heta îroj her çiqes gelek kes derketine û nijada neteweya xwe bi Sumerîyan va girêdane jî, nekanîne li hember rastîniya dîrokê ewqas dûr û dirêj ramanên xwe bipêtin (biparêzin). Çiku di vî warî da van kesena jî lêkolînên zanîtiyê zêdetir li gorî dilxwaziyên xwe lêkolînên xwe çê kirine. Dibe ku ev gotinên li jor û hin gotinên hê gelek zêde jibo me jî bête gotin; lê hema xem nîne. Ji ber vê dabasê em tu carî bi dilxwaziyê lêkolînên xwe çênakin, jixwe çî hewcedariya me û çî jî hewcedariya gelê Kurd bi lêkolînên wilo heye.

S. N. Kramer çiyayên Zagros mîna Welatê Sumerîyan dipejirîne û dibêje ku; Sumer ji herêma çiyayên Zagros hatine xar û çanda Ubeyt ya bi cotyariya neolitik li ser gelên xumalî hikimdarîyên xwe çêkirine, dibêje (ji

Alâeddin Senel, *Ilkel Topluluktan Uygur Topluluga*, r. 197, V Yayinlari, 3. baski, 1991 Istanbul).

Ji ber têkilîyên di navbera Kurd û Sumerîyan da, an jî bi gotinekî din ji ber wekhev bûna gelê Sumer û Kurd em dixwazin bi eşkeretî wek navê *Zimanê Kurd-Ewrûpî* bi nav bikin. Divê tu car neyê bîr kirin ku bingeha van zimanan zimanê Sumerî ye. Û bandora vî zimanî ne tenê li ser zimanên **kurd-ewrûpî** bûye, dijane li ser gî zimanên din jî bûye. Gelek sosrete û hêjayî gotinêye ku hin bêje hene ku di zimanê dîmatîyên (xumalî, xwecîh) Awistralya'yê da jî xwe li me xuyandin didin. Mesela di zimanên dîmatîyên Awistralya'yê da bêjeya „ku“ maneya *xwarin/as* dide û, gava li dûhev du caran hate dubare kirin, yanî mîna „ku ku“ hate gotin jî maneya *as xwarin, xwarin xwarin* dide. Baş e, ma koka van bêjeyan ji ku, ji kîjan zimanî tê? Dîyarîye ku ji zimanê Sumerî raste rast tê. Aha ji we ra ji zimanê Sumerî çend heb mînak:

kú „as/xwarin xwarin“ (di kîldepresa bi numereya 15.27 ‘an da).

kú „xwedî kirin“ (... 15.27 ...).

kú „(tevgera) xwarin“ (... 2.55, 3.138, 5.125 ...).

kú „(alif) xwarin“ (... 21.56 ...).

kú „mîtin, mêtîn, mêhtin“ (... 15.217 ...).

kú „daqulandin, daqurtandin, daûrandin“ (... 18.64 ...).

(...)

Bêsik mînak gelek zêdene û hêjayî nirxandinêne. Mesela welatê ku nêzî Awistralya'yê ye, ango welatê Îndonezya'yê jî ji vê nasîba xwe girtiye. Ger me rewşa erdnigarîyê ji ber çav derbaz kir, em ê di vî warî da tenê jibo zimanên dîmatî yên Amerîkayê zêde tiştan nebêjin.

Her çiqas li gorî zimanan merî nikaribe jibo gelek pirsan bersîvê bide jî, dîsan jî di roja me ya îroyîn da ziman gelek rolekî mezin dilîze. Dilîze, ji ber ku ew kesên ku dibêjin ziman ne ewqas girînge, mixabin ku dîsan van kesana li ser zimanan dixebitin û dixwazin zimanên xwe bi zimanên herî kevn va girêdin; ango bi zimanê sumerî, hetîî, hurî, urartî, medî, mîtannî û bi yên din yên ku li Mezopotamya'yê û Kurdistan'ê jîyan e. Dîsan mixabin ku, gava evan kesana bi gotinên xwe yên ku mêjîyê mirov tu carî nikare bipejîrîne, derdikevin holê, dibin lêkolîvan, dibin pîspor, dibin mirovên herî zana û gelek tiştên din. Lê gava camêrek derkeve û bêje: „Van zimanên kevn li gorî me bi zimanê kurdî va girêdayî hev in“, de hun sêri (mêyzî) hengemeyan bikin. Wê çax van kesana dibin dîn, dibin nijatperest, dibin bêaqil û hwd.

Di van salên dawîn da çend nivîskarên kurd jî derketine û li gor ramanên xwe çend îdîa yên xwe berepêş kirine. Di van pêsniyaran da yên ku herî balkêsin û cîyekî girîng digirin jî, gotinên ku li ser zimanê kurdî hatine gotin in. Ma çima cîyekî girîng digirin? Ji ber ku, di nav van îdîayan da, çewtîyên ku mêjîyê mirov nikare bipejîrîne,

hatine kirin/nivîsandin. Etîmolojî ya bêjeyan wek çîrok, çîrçîrok û sitranan hatine nivîsandin. Naxwazim li vir navên çend kesan bidim. Ji ber ku herkes bi xwe zane. Divê rewşenbîrên kurd, xwe, ji van xebatên nebaş xelas bikin. Ma li dinyayê çend xelk hene ku ji kurdan bêtir bi lêkolînên zanyarî pêvistîyên xwe hebin? Mixabin ku xênji kurdan li meydanê tu xelk tune.

Li gorî me, jibo kurdî ya nûh tiştê ku herî girînge, yek ji van zimanê Medî'ye. Kesên ku li ser zimanê kurdî xebatên xwe dikin , divê zimanê Medî wek bingehîn bigirin. Xebatên ku me li ser vî zimanî kiriye, xwe li me vekirî nîşandaye ku, mirov nikare herdu zimanan ji hevdu cihê bike. Ev gotina me jibo hemu zimanên ku li mezopotamya'yê jîyane dikane bê pejirandin.

Jixwe em ê di rûpelên paş da jî mînakên xwe kur û fireh bidin. Her çiqas wiha bibe jî, dîsan jî çend mînakên ku wê di nivîsên me yên paşînî da cîh negirin, dixwazin li vir li xwendevanan pêşniyaz bikin. Wek me berê da jî gotiye, bandora zimanê Sumerî gelek xurt li ser zimanan bûye. Bandor, di nav zimanê Xaldî (urartu) û Hurrî da jî xwe li me nîşandin dide. Wek mînak: Di zimanê Xaldî da bêjeya *šala*, ya ku maneya *keç*, *qîz* dide; dîsa di zimanê Hurrî da jî bêjeya *sila* eynî manê dide. Lê belê bêje aîdî zimanê Sumerîye û di Sumerî da heta bêjeya *sal* (di kîldepresî bi numereya 5.233'an da) pasda tere. Bêje, maneya *rûva/navrana jinan*, *orxana jiniyê* dide û, dîsa

sal^{sa-al}-la jî maneya *rûv*, *navran û navran(-a jinan)* (di kîldepresî bi numereya 15.1435'an da) dide.

Ne hewceyî dirêj kirinêye, jixwe em ê di hejimarên me yê da hatû da lêkolînên me yê ku li ser zimanê Sumerî û zimanên din yê ku li Mezopotamya'yê û Kurdistan'ê jîyane, kur û fireh bidin. Li gorî van lêkolînan em ê gî bi tevayî jî bibînin ku, tiştê ku em dibêjin, yanî ev gotina ku me li jor jî got, zimanê Sumerî û Kurdî ji eynî hîmê tîn, wê bi mînakên bête berepêş kirin. Di eynî demî da ji ew xelkên kewin yê ku kal û bavên Kurda bûn jî, em ê mînakên xwe li cem bidin.

Zimañê Toxarî jî ji van gotinên me nikane xwe rizgar bike. Dîsa ev zimana li gor zimannasan jibo zimanên **kurd-ewrûpî** pir girînge. Gava me sêrî (mêyzi) vî zimanî kir, wekî ku xwe jî dîtbarê, em ê bi hêsanî pê bigêhêjin ku ev zimana jî di nav zimanên **kurd-ewrûpî** da xwediyê rolekî asîkare. Lê hema vî zimanî ew bêjeyên ku bi zimanê Kurdî va hevcotên hev in, li gor qeyîdeyên xwe gelek cuda guhartîye. Belam, ev qeyîdeyên cuda di nav zaravayên Kurdî da jî hene; incax ew nayê vê manê ku, zaravayên Kurdî ji hev cuda ne, ne ji eynî kokê tîne. Her wiha ev cudahîyana jibo zimanê Toxarî jî divê wisa bê pejirandin. Wek mînak:

Toxarî

ñakte [A ñkät]

cake

Kurdî

xwedê

cem

<i>genna</i>	<i>jin</i>
<i>tañ [A tñi]</i>	<i>(ya)te</i>
<i>meñe [A mañ]</i>	<i>meh, mang</i>
<i>ñu [AB]</i>	<i>neh(e)</i>
<i>ñwe [A ñu]</i>	<i>nû, nûh, new</i>
<i>yšiye [A wše]</i>	<i>sev</i>
<i>salyiye</i>	<i>sole-d (zazakî = xwê)</i>
<i>pikul</i>	<i>sal</i>
<i>swese</i>	<i>silî</i>
<i>pär</i>	<i>birin</i>
<i>pärsk-</i>	<i>tirsîn</i>
<i>prek-</i>	<i>pirsîn, pirs kirin</i>
<i>ku [=A]</i>	<i>kutî</i>
<i>kē_u [ko]</i>	<i>ga</i>
<i>keni[*kanwe]</i>	<i>junî, çok, çong, qomik, kab</i>
<i>kna [=A]</i>	<i>zanîn</i>
<i>krake [=A]</i>	<i>qirêj, qilêr, gemar, semar</i>

Mînak ne tenê ev çend heb in, dijane diha gelek pir in û hêjayî nivîsên kur û fireh in. Van mînakên ku me li jor dan e, hema hema gî di zimanên **kurd-ewrûpî** da hene. Me xwast ku li vir çend heb bêjeyên zimanê Toxarî û Kurdî hevberkî bikin û bi vî awayî jî kesên ku têkilîyên xwe bi vî zimanî va hene, bi van wekokan jî nîşandin bidin ku ev herdu ziman jî bi bingeş û bi naverokên xwe va girêdayî hev in. Lê di nav van herdu zimanan da, zimanê

ku herî nêzikî zimanê Medî û Sumerî ye , ew jî zimanê Kurdî ye.

Di zaravayên Kurdî da zaravayekî wek ya herî bingehîn pejirandin dîyarîye ku çewtîyekî pir mezin e. Ji ber ku ew hin bêjeyên ku di zimanê Sumerî, Hetîti, Medî, Kassitî, Hurri, Mîtannî, Subarî û êd. da hen in, mixabin ku di zaravayên mezin da, ango Kurmancî û Soranî da tun in, di zaravayên an jî di devokên herêman da xwe xuyandin didin. Ji ber vê jî divê kesên ku mujilîyên xwe bi zimanê Kurdî va hen in, gerek bala xwe baş lê bidinê. Mesela di zimanê Medî da bêjeya *zaredhya* wateya *dil* dide, lê belê bêje di zaravayê zazakî da wek *zer* sekinîye û ji bêjeya *dil* bêtir xasî maye. Dîsa di Kurdiya rohilat da mîna *zik*'e. Bêje heta zimanê Hetîti paşda diçe û hê gelek zimanên din da jî heye. Di zimanê Hetîti da *ker*, *kard-*, *kardi-* (genîtif *kardiyas*), Palayî *kart-*, Sanskritî *hṛdaya*, *hṛd*, Afganî *zirah*, Ermenî *sirt*, Osîya Basur *zarda*, Dîgorî *zerde*, Toxarî *zärdä*, Latinî *cor*, Îngîlîziya Kewin *hart*, Î. ya nûh *heart*, Cermenî **hertan*, Yewnanî *kér*, Îrlandî ya Kewin *crida*, Lîtvani *širdis*, Rusî *seredina*, Holandî *hart* wateya *dil* dide û hê di nav zimanên din da jî mewcude. Bêje di zimanê **kurd-ewrûpî** da jî mîna *kêrd-*, *kṛd-* tê siviyanandin (karanîn).

Mînakê din jî *an*, *ana*, *anê* yanî *dê*, *dayik* e. Bêjeya ku em dixwazin li ser bisekinin ew jî bêjeya *ana* ye. Bêje di zimanê Tirkî da jî wek *ana*, *anne* derbaz dibe. Dîsa

Hetîti *anna-*, Luwî *anni-*, Lîkî (Lîkyayî) *eni*, Palayî *anna-*
ye û li gorî me koka bêjeyê heta tîpa (= bêjeya) *a* diçe û
peyvekî Sumerî ye.. Wilo ku, di Sumerî da:

a (ji *a* 1.) „ana, anê, dê, dayik“ (... 15.1416 ...).

Lê belê bêjeya *a* jî ji alî etîmolojîyê va heta bêjeya *a*
l. diçe. Wiha ku:

a (1) „dan ber girtin, hilberandin, xetandin, zeyandin,
zayîn“ (... 5.1 ...).

^{a-a}**a** (ji *a* 1.) „dan ber girtin, hilberandin, xetandin,
zeyandin, zayîn“ (... 15.969 ...).

a (ji *a* 1.) „zeyandin, zayîn“ (... 5.1 ...).

(...)

(Bnr: *Sümerce-Kürtçe Üzerine Bir
Deneme/Etimoloji, Cilt 1.*, Bêyhanî Sahîn, hê çap nebûye).

Bêjeya *a* (dayêk) ji maneya *a* (zayîn) xuliqîye. Ango
bêjeyên *jin* û *dayik* ji maneya *zayîn*'ê peydah bûne. Mesela
di zimanê Kurdî da bêjeya *jin* ji maneya *zayîn*'ê xuliqîye.
Û tu pêwendîyên xwe bi bêjeyên *jîyîn*, *jîn* û *jîyan*'ê va tun
e.

Di nav Kurdên ku nefî Anadolîyê bûne da, jibo *dayik*
bêjeya *a* bi kartîn in. Yanî gava zarok bang li dayika xwe
dike wiha dibêje: *Ayê* (yanî *dayê*) dibêje. Di nav bêjeya
ayê da tîpa yekemîn, yanî *a* têtê maneya *dayik*, *y* gîhanek û
ê jî *rewşa mê* nîşandin dide. Bi şiklekî din: **a** = *dayêk*, **y** =
girêk, **ê** = *rewşa mê*. Li herêma ku ez bi xwe jî jîyame, dîsa
bêjeya *anê* bi kartê.

Î. Z.Eyüboğlu jibo etîmolojîya bêjeya *anne* wilo dibêje: „Di devokên Tirkî da: *aba, apa, ana...*di dengên *b, p* da her çiqas wergerek li dengê *n* hebe jî, ji koka *an* ya ku di zimanê Hetîtî da ye nikane bêtir şunda biçe. Bêjeyên ku di zimanê Hetîtî da derbaz dibin, yên piranî, hatina ji zimanên kewin yên Anadolîyê ji ber çav nayê dûr xistin, çavkanîyekî Anadolîyê bûyina koka *an* vebirî ye“, dibêje (*Türk Dilinin Etimoloji Sözlüğü, rûpel 33, Sosyal Yayinlari, 1991 Istanbul*). Dîyarîye ku camêr di vî warî da nav xeletîyekî daye, yanî koka bêjeyê heta zimanê Hetîtî paşda birin, bi vî zimanî va girêdayîn û mîna bêjeyekî xweru î zimanê Hetîtî hejmartin, koka *an* mexsusî zimanên Anadolîyê ye gotin, neraste. Ji ber ku bêje bi xwe, ji binî heta serî Kurdistanî ye, Mezopotamyayî ye û wek me bi mînakên jî nîsandin da aîdî zimanê Sumerî ye. Me dikaniya numuneyên xwe gelek zêde bikira, lê belê ma ew wekokên ku me dane nebesin? Î. Z. Eyüboğlu li ser vê mijarê ango li ser bingeha zimanan qesî ku ji xwe hati ye, dixwaze zimanên Anadolîyê dayne ber zimanên Kurdistanê û Mezopotamya'yê. Heger bandora ziman û çanda Kurdistan û Mezopotamya'yê li ser erdnîgarîya Anadolî'yê tunebûyana, wê Anadolî'yê bi tena serê xwe tu wateyek nekarîbûya bidana.

Di nav gel da hin bêje hen in ku heta li destpêka cîhbûyîna mirovahîyê paşda diçin. Mirov bi hêsanî dikane bêje van bêjeyana bi tena serê xwe wek dîroka mirovahîyê

ne. Ji alî din va hin kes hene li dijberî van bêjeyan derdikevin û dixwazin van bêjeyana bi bêjeyên nûjen va biguherîn in. Her çiqes em nûjen dibêjin jî bi xwe ne ji nûjentîya xwe, lê bi bê nûjentîya xwe wek numuneyên herî sosret li holê tip û tazî dimîn in. Di Kurdî da ango di nav gelê Kurd da jibo bêjeya *doxtor* bêjeya *avza-n* bi kartê. Mixabin ku hin kes li dijî vê bêjeyê ne. Sedem jî kewn bûyin e. Li gorî me ev nexweşîya ji Mamosteyên Mezin Tirkan pêmahîyek e. Wek me got, bêjeya *avza-n* jibo maneya *doxtor* bikartê û bêjeyekî xasî ya aîdî zimanê Sumerî yê, ku di zimanê Sumerî da jî seba eynî manê hatiye bi karanîn. Di Sumerî da wek *azu* (*a-zu*) tê nivîsandin û ji bêjeya *a* û *zu* xuliqîye. Bêje di kîldepresa bi numereya 1. 106'an da maneya *khahîn*, û di kîldepresên bi numereyên 2.113 û 5.16'an da maneya *falbêj*, *falevêj*, *bextbaz*, *remildar* dide. Dîsa ^{li}*azu* maneya „doxtor, magî, sêrbaz“; ^{li}*azu tur* „doxtorê stajyer (?), ^{li}*azu sag* „serdoxtor“ û dîsa ^{munus}*azu* jî maneyên *jindoxtor* û *jina magîvan/sêrbaz* dide. Maneya bêjeyê yê xasî, wateya *zanyarê avê*, ye. Kite (=bêje) ya yekemîn *a* „av“, û ya duwemîn *zu* jî maneya *zanîn* dide. Herdu bêje jî di gî zimanên **kurd-ewrûpî** da derbaz dibin. Bêjeya *zanîn* ji bêjeya *zu* tê. Bêjeya *azu* ji hêlê din va di Akadî da *asû* (doxtor), Aramî *'āsīā* (doxtor), *'assī* (xwes kirin), *'āsūtā* (tîmar, tedawî), Erebi *'āsi(n)* (doxtor), *'asā*, *'āsā* (xwes

kirin) û di zimanê Îsboyî da jî mîna *ʿasōt* (tîmar, tedawî) derbaz dibe.

Wek me dît, jibo bêjeyan bîryarên ewqas erzan wê di nav zimên da birînên ku tu car neyên xweş kirin, vebike. Tiştê ku me di nav jîyana civatê da ditîye, ew jî li ser vê mijarê nezanîyekî pir mezin e. Di vî warî da rebenên herî mezin jî rewşenbîrên Kurd in. Li ser bêjeyan galegaleyên ku mirov kennan didin kuştin, çêdikin; û di nav gel da dibin belavbûna sebebên ramanên çewt. Niha em li vir kîjan mînakên bidin, bi xwedê jî nizan in. Ji ber ku herkesî li gorî xwe pîvanek pêgirtîye û kilamê xwe yê „ya min ji gîştîyan rastire“ dibêje û diçe. Mesela hin kes seba hin bêjeyan dibêjin Erebiye, Farsiye, Yewnanîye, Latinîye û nizan im ji kîjan zimanî û zimanî ye û ji ber vê jî hewce nîn e ku em van bêjeyana di Kurdî da bikarbîn in, dibên. Bi pêlî-pêlî kirî carek din dixwazin li vir bêjin ku: *Bi sedan bi hezaran bêjeyên ku di nav van zimanan da hene, hezar car mixabin ku aîdî van zimanan nîn in. Ger em jibo koka bêjeyan paşda biçin, em ê ta bigêhêjin zimanên kewin yên Mezopotamya'yê.*

Êdî, divê em niha derbazî mînakên xwe yên ku me dixwast bidin, bibin. Mînakên me cinavkên *ku, kî, kijan, çi, çawa* û hwd. di nav beşekî da; cinavka *ez* û *xwe* di nav beşekî da; girêka *û* di nav besekî da; daçeka *da, di ... da* di nav beşekî da û dîsa daçeka *bi* jî di nav beşekî da em ê pêsnîyaz bikin.

-ku-

Sumerî:

ki (1) „erd, cîh, geh“ (... 1.76, 2.207, 3.98, 5.116 ...).

^{ki-i} **ki** (ji *ki* 1.) „erd, cîh, geh“ (... 15.245 ...).

KI(ki? gagar?) (ji *ki* 1.) „(rûyê) erd(-ê)“ (...1.176 ...).

ki (ji *ki* 1.) „(rûyê) erd(-ê)“ (... 2.207, 5.120, 15.900 ...).

ki (ji *ki* 1.) „herêm, dever, erd, zemîn, ax, xak“ (... 15.634 ...).

ki (ji *ki* 1.) „erd, zemîn, ax, xak“ (... 5.120 ...).

^(ki-i) **ki** (ji *ki* 1.) „erd, zemîn, ax, xak“ (... 15.245 ...).

ki ji (ji *ki* 1.) „erdê xwe, axa xwe, xaka xwe“ (... 15.634 ...).

ki (ji *ki* 1.) „erd, sun, cîh, mehal“ (... 1.176, 2.207, 3.59, 5.116, 10.128 ...).

^{ki-i} **ki** (ji *ki* 1.) „erd, sun, cîh, mehal“ (... 15.82 ...).

ki (ji *ki* 1.) „cîh, sun, meydan“ (... 5.117 ...).

^{ki-i} **ki** (ji *ki* 1.) „cîh, meydan“ (... 15.82 ...).

^{ki-i} **ki** (ji *ki* 1.) „dîyarê miriyan“ (... 15.245 ...).

Di zimanê sumerî da Cinavka pirsê „ki“(ku) ji maneya „ki“(cî, cîh) peyda bû ye. Di zimanê kurdî da jî wek „cî, cîh“ xwe nîşanî me dide; û her wisa jî derbazî gelek zimanên din bûye.

ki (2) (ji *ki* 1.) „ku, ki, ka?“ (di tableta bi nimereya 1.176, 15.210 an da).

ki (ji *ki* 2.) „wir da, ew derê da“ (...15.82 ...).

ki (ji *ki* 2.) „li ku herdem?“ (... 15.210 ...),

ki (ji ki 2.) „bi ku va herdem?“(... 15.210....).

ki----a (ji ki 2.) „ku, ki, ka?“(... 15.83 ...).

(ki-)a-ba (ji ki 2.) „ku, ki, ka, erdê ku li cem e“(... 17.93 ...).

ki-ba-a (ji ki 2.) „li wir, li wê derê“(... 7.467, 15.78 ...).

ki-ba-a (ji ki 2.) „wir da, wê derê da“(... 15.78, 82 ...).

(ki-)me-a (ji ki 2.) „ku, ki, ka“(... 6.41 ...).

ki-me-a (ji ki 2.) „kîjan?“(... 15.25, 22.193 ...).

ki-me-şê (ji ki 2.) „kîjan?“(... 15.25 ...).

(ki-)me-şê (ji ki 2.) „kiva, kuve, kuda?“.

ki (3) (ji ki 2.) „çawa, çer, çito, çilo?“(... 7.24/25 ...).

Heftî:

kuwapi „ki, ku, ka, kuve, kuda, kengî, çaxê, li (bi) derîkî (ve), demekî“.

UL kuwapi „li ti cîyekî, ti carî, ki, ku, ka, kuve, kuda, kengî, ger pasê, dema/çaxa ku, her ku hebû“.

kuwapi kuwapi „li (bi) ku (ve) herdem“.

kuwapi imma kuwapi „û diha kuve/kuda“.

imma kuwapi „li derek din“.

kuwapiya „li herder, bi herderî va, herçax, herdem“.

kuwapit „ki, ku, ka, kiva, kuva, kuda“.

kuwapit kuwapit „li ku herçax, li ku herdem“.

kuwapit imma kuwapit „diha ku“.

kuwat, kuuat „çima, çira“.

kuwat imma kuwat „ger wiloye çima diha“.

kuwatta(n), kuuapi (û him jî *kengî-ê, çaxê*) „ki, ku, ka, ka, ki ve, ki va, ki da, ki ra, ku ve, ku va, ku da, ku ra“.

kud(-) „ki, ku, ka“.

kuuatta(n) „ki, ku, ka, ki ve, ki/ku va, ki/ku da, ki/ku ra“.

ka „vir, vira, vir ve/da, vira ve/da“.

ka- „vî“.

ki „va“.

kenzan „vî“(genîtif-piranî, ji **ka**).

kit „vir, vira, vir ve/da, vira ve/da“(lokatîf, ji **ka**).

kuiski „yek ji yê(n) te“.

kuis, kuit „kî, çî, kîjanî, kîjanê „heryek“.

kuitta „gî, gîştî, gîş, hemî“.

kuiski, kuitki „kesek, hinek“.

UL kuiski „ti kesek, ne(yek), ne(tiştek), hîç...tine“.

UL kuitki „ti tist, hîç tine/nîne“.

kuis cuis „her kî“.

kuit kuit „her çî...e, vi/ji (alm. dass), ji vê demê, piştî“.

kuit imma „çiçes pirtir be“.

kuitta „herkes, heryek, gî, gîş, gîşt, gîştî, hemî“. *kuitki* „hinek, hindik, bi awayekî, bi toregekî“(an jî *kuitki* „hîç“).

kussan „kengî,çaxê,çaxtê“.

UL kussan „hîç, ti carî“.

-ku „heger, eger, ku“.

kuit „çi ki, çi ku, çinki-u, ji ber ki, ji ber ku“.

Medî:

ka (sumer. ji *ki* 2. + jibo **çi**: *ki* 3.) „kî, çi“ nomînatîf yekani û nêr *kô* vd. 2, 138. 3, 39. 18, 33. yt. 10, 108. 14, 47. *kase-thwām* „quis te“ y. 9, 10. *kas-tê* „kî(yî) tu[tê bê maneye]“ y. 29, 7. *kasčît* „aliquis“ vd. 8, 282. y. 13, 24. „quilibet“ vsp. 3, 25. yt. 5, 101. *âaṭ vō kasčît mašyânām uiti mraoṭ ahurō mazdâo* „paşê ji we însanan herkes, got Ahura Mazda“ yt. 19, 53. *kasčît* „her, heryek, herkes“ y. 48, 5. *kasčîtčâ* y. 64, 18. ké y. 43, 16. y.29, 1. 43, 5. 7. 12. *ké ... thwaṭ* „ji xênji te kê bandor çêdikir“ y. 43, 3. *mê kâ* y. 34, 5. 43, 19. 9, 10. vd. 3, 124. 14, 65. yt. 21, 6. 8. 10. 12. 14. 16. *kê asti ... parairisti* y. 23, 5. *kâčît (tanu)* y. 17, 55. *âpem aêšemnáo havâi kâčît náfyâi* „(Fravaşi [mê]) avê bisînin, heryek ji xizmên xwe ra“ yt. 13, 66. *bêcins kaṭ* vd. 3, 97. 13, 1. y. 19, 53. 34, 5. 12. yt. 1, 1. *kat asti frameretis* „kîjan (an jî çawa) jiber dixwîne“ y. 70, 2. *kaṭ tōi ... avanhô* „çiyê te heye jibo alîkarîyê“ y. 48, 12. *kaṭ ... čahyâ avanhô* „yê alîkarîyê çi“ y. 49, 1. *kat zî asti ... dâityôtemô yasnasca* „kîjane (= çawaye) Yasna'yê herî rastinî“ yt. 8, 57. *kat* „çaxê, kengê“ vd. 7, 2. y. 28, 5. yt. 8, 9. *kaṭ máo ukhšyêiti* „çiqas mezin dibe hîv“ yt. 7, 2. *kaṭ* „çawa, çilo, çer, çiton“ y. 47, 2. gava di destpêkirina pirsekî da vd. 5, 160. 7, 59. 65. 72. 8, 39. *kaṭ ašava vanaṭ drvañtem* „ma yê baş li hember yê nebaş bi

serkeve“ yt. 1, 28. goreyî/relatîf: *vîspê âfrînâmi ke asti vohu aşava* y. 67, 49. akuzatîf nêr *kem* vd. 17, 2. *kem idha tê zaotrâo bavaiñti* „zu wem (kommen) die dir (dargebrachten) Zaothrasma“ yt. 5, 94. *kemciṭ paiti çathrušanâm* „ji pas çar kosê“ vd. 2, 61. 6, 66. *kemciṭ* „her, heryek, herkes“ vd. 7, 128. *kemciṭ aipi nmânê* „li cem her malî“ yt. 5, 102. *kém* y. 29, 2. *mê kâm* y. 45, 1. *kamciṭ* yt. 4, 6. *bêcins kat* y. 34, 12. *fermanî nêr kê asti ithyêjâo marşanonô* vd. 18, 21. *kâciṭ vâ gaonanâm (pasûm* „kerîyek pez“) „ji gonekî/rengekî“ yt. 8, 58. *bêcins kê* „çawa, çiton“ y. 69, 17. 43, 8. 47, 8. datîf nêr *kahmâi* vd. 2, 2. y. 29, 1. *ayâo kahmâi* „ji kê ra ji (alî b.s.) herduyan“ y. 43, 15. *hôi ... jañtû ... ahmâi yahmâi vaşî kahmâiçîṭ* „ji wî ra (sadiqî bê), [kes] ê ku tu ji wî ra herdem diwazî“ y. 43, 16. *kahmâiçîṭ* „jibo herkesî, jibo heryekî“ vd. 13, 99. y. 19, 27. *para kahmâiçîṭ* „xênjî yekî/kesekî“ vd. 7, 77. *kahmâiçîṭ hâtâm* y. 35, 23. *mê ûdâi kahyâiçîṭ* Y. 33, 11. *bêcins kahmâiçîṭ* yt. 13, 41. ablatîf *bêcins kahmât* vd. 15, 55. *yahmât kahmât naêmanâm* „ji kîjan hêlê va berbi vira“ vd. 8, 248. *ahmât kahmâtçîṭ* „ji herderê va berbi vira“ vd. 8, 249. *genîtif nêr kahê* vd. 19, 28. *li cîhê mê* yt. 13, 50. *kahyâ ahî* y. 42, 7. *kañhê kañhê apaghzharanâm* „li cem gî qenelan“ yt. 5, 101. *kahyâçîṭ hâtâm âtarâis* „mehlukên ku gî nebas in“ y. 13, 16. *kahyâçîṭ*

khrafstranām avajanyāt „kesek, (ew) yê ku Khrafstra'yê dikuje“ vd. 16, 28. *mê kahhâosçit* yt. 21, 5. lokatîf *kahmi* yt. 21, 1. *kahmi kahmiçit* „di nav heryekî da“ yt. 11, 5. nomînatîf *piranî û nêr kôi* y. 47, 11. *kôi nmânahê* „yên ku li malin kîjan in (goreyî/relatîf)“ yt. 2, 11. *kaya ratavô* „kîjan in mêr“ y. 19, 50. *kaya aêtê vaça* „kîjan in van bêjeyana“ vd. 10, 7. 13. 19. akuzatîf *nêr kéng* y. 47, 11. bêcîns *kâis hê afsmân* „kîjan in serpariyên“ y. 19, 45. datîf *nêr kaêibyô* y. 43, 6. 45, 3. genîtîf *nêr kâmcit aêsmanâm* „ji gî darên sewitî“ vd. 18, 49.

katha (ji *ka*) „çawa, çiton, çer, çilo, ki, ku, ka, çaxê, kengê“, *katha* „çawa“ vd. 9, 20. y. 60, 16. 64, 34. yt. 22, 16. *kathâ* y. 42, 7. 43, 2. 45, 1. *katha* „çaxê, kengê“ y. 8, 5. *kathâ* y. 8, 5. *kathâ* y. 43, 17. *ki/ka/ku* y. 29, 2. *yatha kathaça* „mîna herdemî“ vd. 2. 41. *mâ adha kathaçina paitijimê*

kadha (ji *ka*) „çawa, çiton, çer, çilo“ vd. 19, 103. çaxê, kengê yt. 10, 86. *kadha-nô* yt. 8, 5. *kadâ* „çawa, çiton“ y. 29, 9. 47, 9. çaxê, kengê y. 45, 3. 47, 10.

kaya bnr: *ka*.

kavaca bnr: *kva*.

kahê, kahm^o, kahy^o bnr: *ka*.

kâthé (ji *ka*) „çawa, çiton“ y. 43, 2.

kit bnr: *cit*.

ku (1) bnr: *ka*.

ku (2) (ji *ku*) „ku“, *kû* y. 50, 4. 52, 9.

kutha (ji *ku* 1.) „çawa, çiton, ço, çer, çilo, li ser kîjan zemînî“ vd. 2, 93. 5, 35. 19, 39. yt. 4, 5. 10, 121. 17, 57.

kuthra (ji *ku* 1.) „kiva, kuva, kuda, kura“ y. 45, 1. çawa y. 64, 35. *kuthrâ* „ku, ka“ y. 34, 7. 43, 15. 50, 4.

kudat (ji *ku* 1. + *dat*) „li derekî/li cîyekî, bi awayekî/bi toreyekî.“

kudaşâitya (ji *kudat* + *şâitya*) „bi awayekî pejirî, bi toreyekî pejirî“, *akuzatîf asô râmôdâitîm nôit kudatşâitîm* vd. 1, 2.

kudâ (ji *ku* 1.) „çaxê, kengê“ y. 29, 10.

kudô (ji *ku* 1.) „qe, qet, tu, hîç, demek, wextek“ y. 39, 5.

kudhôzâta (ji *kudô* + *zâta*) „(yê/ya ku) wextekî zayîye“, *genîtîf pîranî kudhôzâtanâmçî narâm nâirinâmça* yt. 13, 154. y. 39, 5.

kunâiri (ji *ku* 1. + *nâiri*) „jinekî çawa“-jina neçê, ya ku bi kesên din va radikeve/seks dike-[»] nomînatîf *daêvanâm kanâiris* vd. 8, 100.

kû bnr: *ku* 2.

ke bnr: *ka*.

ké, kêm, kéng, kôi, kâm bnr: *ka*.

kva (ji *ka?* + *ku?*) „ku“ vd. 6, 92. 19, 89. yt. 22, 1. kuva, kuda, kura vd. 6, 92. *yatha kavaça* „bi kuva herdem“ vd. 1, 55. *kva asti ... dâityô gâtus* „ma li ku ye cîyê hawe/minasîp“ vd. 13, 49. *upa kvaçî aňháo zemô*

„herderê li ser erdê“ yt. 12, 22. *kva aêšâm* „bi kuva ji van (orxanan)“ vd. 8, 132. *kva* „çawa, çiton, ço“ yt. 14, 42. vd. 19, 144. *kvaciŕ* „qe, qet, tu, hiç, demek, wextek“ y. 23, 5.

ča (1) „daçek, û gelek zêde li pas qertafa lêkerî tê nivîsandin“, wek mînak: *fracâ kereŕtaŕ* y. 9, 27.

atča (ji *at* + *ca*) „û him jî“, *aŕčâ hyat* y. 30, 4. *aŕčâ* „serda, serva, serra, di ser ra“ y. 29, 9. 48, 3. [Latinî *ac, atque*].

ča (2) „her kîjanekî-ê, îlekesik, îlemêyek(ê), îlekesikê“, nomînatîf *čaŕ*, datîf *yahmâi nôit*, *čahmâi naêmanâm karana* yt. 13, 3. genîtîf *kaŕ čahyâ avañhō* y. 49, 1. *čahyâ* „li sertistekî (hikim ajotin)“ y. 47, 9.

čaiti (ji *ka*) „çend“, *čaiti* vd. 5, 60. 4, 4. 15, 1.

čat (ji *ca* 2.) „daçeka ku gelemperî dike“ [Pehlevî *čikâmčâti*].

či „(koka cinavkê) kî, kîjan, çawa pêyda kirin“, nomînatîf *čis* „kî, çi, yekî çawa“ y. 42, 7. yt. 14, 34. vd. 9, 187. 18, 83. *čis aêša nâirika paoirîm qarethanâm qarât* „kîjan xwarinê dikare va jina berê bixwe“ vd. 5, 147. *cisca* „kî, çi, yekî çawa“ yt. 22, 10. *yō čis* „heger yekî, kîjanî“ y. 9, 86. *nôit zî čis* Fr. 8, 1. *yêstê čisča spénistō* „yê pîrozwer. yê ku ji hemîyan herî pîroztire, ew jî ez im“ y. 42, 16. bêcins *čit* y. 9, 10. 19, 2. *astiča îm zâo avaiti bāzō yavaiti frathascit* „va erda wilo mezine di

kurahîyê da mîna bi firehîyê“ y. 19, 15. akuzatîf nêr *čim* vd. 19, 140. *čim framraot* „ji kê ra wî peyivîya bûbû“ y. 10, 56. 20, 8. *čim* y. 21, 3. *čim hakha hašê baraitê* „heval kî dihêne/tîne hevêl“ y. 61, 21. *mê čim* yt. 10, 71. ablatîf *mê čyañghat* „çima“ y. 43, 12. nomînatîf *piranî čayô aêtê raocáo aňhen yô* „ronahî(piranî) çawa hatin afirandin; kîjan“ vd. 2, 130. *čayô aêtê maêsmâ aňhen* „ma divê çawa bibe va mîza“ vd. 8, 32. akuzatîf *bêcins čičâ* y. 46, 5. [Kurdî *çi*, Pamîrî (*tsa*) *tšiz*, Pehlevî *cis* (hinek), Parsî *čis*, *či*, Farsî *čih*, Afganî *čih*, Belucî *či*, Osî *či*].

čit (ji *či*) bnr: *pasča čit ahê yatha azâni* „ku li pas wî min def kir“ yt. 9, 30. [Sasnkritî *čid*, Farsîya kewin *čiy*, Pehlevî *čâi*].

čina (ji *ci* + *na*) „cînavka pirsê“, akuzatîf *cinem qarethem frabarât* „ma divê ew li ser çi xwarinê onî/bîne“ vd. 16, 13.

čina (ji *cina*) „daçeka ku gelemperî dike“, wek mînak: *avaspastičina* yt. 11, 5. *kasvikâmčina yáoñhuyanâm* vd. 18, 81.

čičâ bnr: *či*.

ču (1) (ji *či?* + *ča?*) „daçeka pirsê, çawa. çiton, çer, çilo. ço, bi çi awayî.“

ču (2) „koka dažeka pirs lê pirsînê.“

čyañghat bnr: *či*.

čvañt (ji ču 2.) „çend“, nomînatîf *čvās* y. 20, 8. 19, 57. bêcins *čvaṭ mîzhdem* „mûçekî/mizekî/misekî çawa“ vd. 8, 252. *čvaṭ yavaṭ erezatem* „ma buhayê wî [çan] çiqes dibe, heger ji zîv be“ vd. 14, 50. akuzatîf *čvañtem* vd. 7, 5. y. 19, 58. 20, 10. li sunê bêcins *čvañtem zrvânem* vd. 2, 41. *čvañtem drâjô zrvânem* vd. 6, 1. bêcins *čvaṭ* A. 3, 4. *čvaṭ drâjô* „çiqes dûr e“ vd. 3, 56. „çiqes zeman“ vd. 5, 154. *čvaṭ qarethem* „çend xwarin/as“ vd. 16, 15. *yavaṭ čvaṭča hê/čvaṭ...yath* „ji...hê pirtir “ VD. 6, 63. *čvat aêtanhâo âpô...frâšnaoiti* „çiqes li ser vê avê rudinin“ VD. 6, 65. *čvaṭ upamānayān* vd. 12, 2. nomînatîf piranî *čvañtô* vd. 5, 37. [Kurdî *çend*, Zazakî *çend-e*, Pehlevî *čand*, Parsî *cañt*, Pamîrî *tsu n(d)*, *tšand*, Farsî *čand*, Afganî *tsanî*, Gebriyanî *čen*, Latinî *quantus*].

Kurdi(kurmançî):

cî, cîh, cih,ku

ki, ka, kanê, kuderê, li ki/ku/ka

kuder

ki ve, ki va, ki da, ki ra, ku ve, ku va, ku da, ku ra

kî

çi

çi ki, çi ku, çinku

çend

çixes

çawa, çer,ç ito(n), çilo

kes

kedî

ko, ku (mînak: ku neçû, ku bibe).

(dimilî/zazakî):

cay, cayki "cîh, sun(d), erd, li cîyekî, li derekî (= pîranî)."

cayî "kedî, cîh bûyî (-tî)."

ka, kanî, koca, komca "ki, ku, ka, ko kuder."

kota, kata "ki ve, ki va, ki da, ki ra, ku ve, ku va, u da, ku ra, ki der ku der."

ku ra "ki, ku, ka, ki ve, ki va, ki da, ki ra."

kusera "ki ve, ku ve, ki da, ku da, ki ra, ku ra kîjan hêlê ve, kîjan hêlê da."

kanca, kotî "ki, ku, ka, ko, ki ve, ki va, ki da, ki ra, ku ve, ku va, ku da, ku ra, ki der ku der."

komca "ki(der), ku(der)."

kanî, konî "kanê, li kuye."

kes "kes, kesî, ti kes."

kesî "kesî, ti kesî."

kam-e, kami-d, kom-e, komi-d "kî, kîjan."

kamcî, kancî, kamcîn, kamij "kîjan, kîjanî-ê."

kamder-e, kamderi-d, komder kîjanî-ê."

kamiki-d, kamik-e, komik "kî, kîjan tist."

kamî-e "kî, kîjanî-ê, kî (akuzatîf), kîjanî-ê."

kamkes "kî, her kî ku".

kam keso, kamo "kî, kî ku."

kancîn "kîjanî-ê."

kê "kes, kî."

ko, kue-e "ku, ko(mînak: *ku bibe, ku neçû*)."

se "çi."

seke, seki "çawa ku."

seyîn, senîn, seyini, senên "çawa, çer, çito(n), çilo."

senî, senîwa "çawa, çer, çilo, çito(n), bi çi awayî/toreyî."

senêwa "bi çi siklhi, bi çi awayî, bi çi toreyî."

Sanskritî:

kvá, kútra,, kútra, kúha, ku, kadha (sumer. *ji ki 2.*) "ki, ku, ka".

káh, ká "kî (mê ka)".

kathám, kena "çawa, çito(n), çer, çilo", *kathambuhtal kathamrupa* "çawa wê tedarîk bikin/destxinin", *kiyat* "çiçes mezin e/dirêj e", *kiyat/kiyat avadhi* "çiçes dûr e", *kim kusalam asti bhavatah/kidr'si sthitir bhavatah* "ma hun çawanin."

kvá, kútra, kútra "ki ve, ki va, ki da, ki ra, ku ve, ku va, ku da, ku ra."

kím (= di zimanê kevn da **kád**) "çi", *kidrsca* "her çi..e", *kidrs, kidrksa* "ma yekî çawa."

atha kim "wekî din."

ká "kîjan", *kim artham/kim/kena hetunâ* "li ser kîjan zemînî."

kíyat, yávat, kati „çend.“

kadâ, kârhi, yâtra „kengî-ê, çaxê.“

kiyat „çend, çiqes dûr e.“

kím „çi.“

kíš, kâš „kî.“

kâti „çiqes(pirani).“

kathâ „çawa, çer, çilo, çito(n).“

Palayî:

kui (sumer. ji *ki* 2.) „cinavka goreyî (û pirsê), ku.“

kuiš kuiš bnr:*kui*-.

ku-it (ji *kui*-) „çiku, ji ber ku.“

ku-t[a an jî -g[a- (ji *kui*-) „?“

ku-ua-a-it- (ji *kui*-) „rengpîseyê cinavkî?“

-ku-ua-(a-)at (ji *kui*-) „?“

Luwî:

kuiš (sumer. ji *ki* 2.) „ku, ka.“

Paştoyî:

tsok „kî.“

ts-o „çend, çi.“

Farsî ya kevn:

ka, kas(-ciy) „kî.“

Farsî ya nûh:

kih „kî.“

keh „ki, ku, ka.“

cand „çend.“

Parsî:

ka, kî, ke „kî.“

ku „ki, ku, ka.“

çanî „çend.“

Afganî:

kah „kî.“

kum (ji *katûm*) „kî.“

tşanî „çend.“

Belucî:

ki „kî.“

Osî:

khu „ki, ku, ka.“

khud „çawa, çer, çilo, çito(n).“

ka „kî.“

kadâr, kâcidâr, kâcidârittâr „kesek.“

kadârittâr, kâcidârittâr, çidârittâr „heryek, herkes.“

kâbalti, kâdâm, kumâ, kumâti „ki ve, ki va, ki da, ki ra,
ku ve, ku va, ku da, ku ra.“

kâcâi, kucâi „ji ki, ji ku.“

kâci „kîjan.“

kâcidâr, cidâr „kesek.“

kâd „heger, eger, kengî-ê, çaxê.“

kâdmâ „hînê çiqes dem.“

kâdtâridtâr „herdem, herçax.“

kâi „jî, diha.“

kâm, kâmi „ki, ku, ka.“

kâmdâr, kâmidâr „li cîyekî, li derekî.“

känä, kenä, kenäba, kentä „an jî, belkî.“

kävängä, käyong „heta ki, heta ku.“

ku „jî, diha, heger, eger, pê.“

kud „çawa, çer, çilo, çito(n).“

cal „yê çendemîn.“

caldän „heta, ta.“

çi, ci „çi.“

çidär, cidär „hinek, hindek.“

cidärittär „tistekî.“

cxuzon „kîjanî.“

Osî ya basurî:

ki „kî.“

Dîgorî:

kha, khay „kî.“

khud „kengî-ê, çaxê.“

Toxarî:

khäy (*akuzatîf*) „kî.“

tyi (*nominatîf*) „kî.“

kus(A), kuse(B) „kîjan.“

kos „çend, çiqes dûr e.“

kosne, oki „çawa, çer, çilo, çito(n).“

kospremne „çend, çiqes bi zu û zu.“

kosprem „çend, çiqes dûr e.“

kus, k¹se, ket(e), k²ce, k³tamem „kî, çi.“

kuc yärmaṃ „di nav pîvanekî da.“

kem [tkam] „(rûyê) erd (-ê).“

ka [k_uyal] „çima, çira.“

katu (katu) „çiku, ji ber ku, jixwe, ango, yanî.“

kusne „kîjan“, genîtif *kene*, nomînatîf *piranî k_ucene*, *ke mosam ne* „ji ber çî“, *kucne* [k_uce] „çî ki, çî ku, ji berku, çinku.“

Pamîrî:

kadant, ka, ka'je, kande „ki, ku, ka.“

az ka „ji ki, ji ku.“

tşidu.m, tşai „kîjan.“

tşa „çawa, çiton, ço.“

ki „kî.“

az ka, tşin(d) „ji ku, ji ku da.“

ku'dze „kuva, kuda, kura.“

ku „ko/ku, çiku, ji ber ku.“

ku'nde „vir, vira.“

Almanî ya kevnbilind:

(h)war „ki, ku, ka, ji ki, ji ku (di sedsala 8'an da).“

(h)wie „çawa, çer, çilo, çito(n) (di sedsala 9'an da).“

warumbi „çima, çira (di dorbera sedsala 10'an da).“

Almanî ya navîn ya jêrin:

wār, wōr, wūr „ki, ku, ka.“

Almanî ya navîn ya bilind:

wā, wō, wār „ki, ku, ka.“

wie „çawa, çer, çilo. çito(n).“

warumbe „çima, çira.“

Almanî ya nûh:

wo „ki, ku, ka.“

wie „çawa, çer, çilo, çito(n).“

was „çi.“

wer „kî.“

welche-r-s „kîjan-î-ê.“

wann „kengî-ê, çaxê.“

warum „çima, çira.“

Sexsonî ya kevn:

hwâr „ki, ku, ka.“

hwō „çawa, çer, çilo, çito(n).“

Holandî ya navîn:

waer, wāre „ki, ku, ka.“

Holandî ya nûh:

waar „ki, ku, ka.“

Îngîlîzî ya kevn:

hwer, hwâr „ki, ku, ka.“

hwî, hwî „çima, çira.“

hû „çawa, çer, çilo, çito(n).“

Îngîlîzî ya nûh:

where „ki, ku, ka.“

why „çima, çira.“

how „çiqes, çito.“

which „kîjan, ko/ku/ki (cinavk).“

what „çi.“

which „kîjan-î.“

why „çima, çira.“

who „kî, ko/ku/ki (cinavk).“

where „ki/ku ve, ki/ku va, ki/ku da, ki/ku ra.“

whence „ji kî, ji ku.“

Firansî:

combien „çiqes.“

quel „kîjan.“

que „çi, ko/ku/ki (cinavk).“

quoi „çiyê.“

qui „kî, ko/ku/ki (cinavk).“

où „ki/ku ve, ki/ku va, ki/ku da, ki/ku ra.“

d’où „ji kî, ji ku.“

Norweji va kevn:

hvar „ki, ku, ka.“

Swêdi:

var „ki, ku, ka.“

Gofî:

hvar „ki, ku, ka.“

Latinî:

quo loco „ki, ku, ka.“

quā „ki,ku,ka; çawa, çer, çilo, çito(n); li ser kîjan zemînî;
ki/ku ve, ki/ku va, ki/ku da, ki/ku ra.“

qua, quae, quod „kîjan, ma yekî çawa“, genîtif *quōius*,
datîf *quoi*, ablatîf *quī*, datîf piranî *quēts/quīs*.“

